Kurd û Autonomî

li rojavayê Kurdistanê

22. Çileyê Pêşîn 2009

Di sala 2000 de, gava komîtiya vejandina **Partî Demokratî Kurdistanî – Sûriye** (KDP-S), li derveyê welêt hat avakirin, û di nav axazên(*) wê de (Autonomî / Hukmê Zatî) hate axazkirin, di nav tevgera me ya neteweyî de, li rojavayê Kurdistanê, ew komîtî, wekî gaveke neyar hate dîtin û nirxandin, û ji serî de, bi tundî û tûjî , dijî wê partiyê û durişmên wê, dijî kesayetiyên wê û hevalêd hat peyivîn û belavkirin. Lê dîsa jî ew partî yekemîn hêz bû, ku kanî bû bi sê partiyên dî yên Sûrî re, sala 2003, li Washington, paş gelek gengeşiyan li Ewrûpa û Amerîka, yekemîn hevpeymana demokrat, di nav hêzên kurdî û erebî de pêda bike, û di wê hevpeymanê de tiştekî wilo an nêzîk vê yekê hatibû nivîsandin:

Ji ber ku Sûriye welatekî pirgel e, têde du gelên serekîn, Ereb û Kurd, û bi wan re hindikiyên din ên neteweyî û olî dijîn, lew re pêwîst , ku herdu gelên serekîn, û wan hindikiyan, li gor hebûna xwe, di saya destûrê de, di sûriyeke azad û demokrat de hemî mafên xwe bistînin.

Hêzên Sûrî, yên ku ev peyman bi KDP-S re îmze kirin û bo hinek endamên kongirêsa Amerekî pêşniyaz kirin (**Partiya Rêforma Sûrî, Partiya Nûkirin û demokartî li Sûriye û Tevgera Suryanî**), li gel hinek kesayetiyên nîştperwer û demokrat, baş dizanîn ku axaza KDP-S bo gelê Kurd di bernameya xwe de bi (Autonomî) daye çarçivkirin…Ewana bi wê yekê dilxweş bûn, hema partiyên kurdî, belku bi piranî, li hember wê hevpeymanê bi hişkî derketin.

Îro, paş 6 salan ji wê yekê, û di wê navê de, ji ber gelek egerên navxweyî û mijareyî, û bi taybet yên navneteweyî, ew hevpeyman têkçû, lê dostaniya wan hêzan bi hev re hîn li dar e, û KDP-S ji axaza Autonomî hate ser armanca ,,Sûriyeke Federal", û bi taybet bo gelê Kurdistana Sûrî, tevî ku gelek lêdanên mezin li partiyê ketin, li ba Partiya Yekîtî, ku yek ji xorttirîn partiyên rojavayê Kurdistanê ye, di kongireya 6ê de ,,Autonomî" wekî armanc bo Kurdistana Sûrî di nav bernameya kongirê de ciyê xwe stand û wekî giringtirîn biryara kongirê hate belavkirin.

Hevalêd partiya Yekîtî di kongirê de, bi piraniya %80 ji dengan, ev (Autonomî) pejirandin. Ewên li derveyê welêt hîn, ku rast gelek in, bêtir xwestin. Wan ji partiyê xwestin, ku navê partiyê, wekî di kongirê de li ser dengdayîn çêbûye, bibe **Partî Yekîtî Kurdistanî-Sûriye**. Mixabin, ji ber gelek egerên kevin û taze, partî ji ser hev çû, û niha bi du navan kar dike, li welêt bi navê ,,Kurdî" û li derve bi navê ,,Kurdistanî", hema li gor haydariya min gelek hevalêd partiyê, ji wan jî hinek mezinêd wê, li gel hevalêd derve ne, û dixwazin ku navê partiyê bibe kurdistanî.

Di vir de ya balkêş, ewe ku herdu parên wê (Autonomî) wek armanc niha hildidin. Wilo em dikanin bibêjin, ku rêveçûna ber bi Autonomî û Federaliyê bo rojavayê Kurdistanê gelek hêztir bûye, ne wekî sala 2000î ye…Wek ez hatîme agahdarkirin, wê gaveke wekî vê di nav partiya Azadî de jî bite avêtin…

Hembervaniya erebî ya îraqî, Autonomî li Iraqê jî berê nepdipejirand, piştre Federalî bo Kurdan xist nav belgeyên xwe...Li Sûriye, niha rewşeke wilo tûj û tund pêda bûye, ku yek û yek „Demokartên Ereb!“ daxuyaniyan belav dikin û tiştê dewlet naxwaze bîne zimên, da li ser wê nebe belge, ewan dibêjin. Ji wan jî yek ji mezintirîn serekên „Îlaana Dîmeşq“, ku hevpeymaneke sûrî ya fireh e û di hîviya guhartineke hêdî-hêdî de ye, lingek li vir û yek li wir e. Ew mezinê vê hevpeymanê, mafnas **Hesen Ebdule'zîm** hêrişeke req anî ser axaza „Autonomî“ ji aliyê Kurdan ve, û da nasîn, ku ewana wê li dij bin, û wilo da xuyakirin, ku Autonomî gaveke ber bi parçekirina Sûriye ye, tevî ku ew mafnas e û baş zagona navneteweyî dizane, û di navbera Autonomî û dabeşkirinê „Înfîsal“ ciyawaziyeke mezin heye. Hêja **Ehmed Abo Salêh**, ku ji Baasiyên alîgirê **Seddam Husên** bû, û cîgirê berê yê serokê Sûrî yê mirî bû, dide xuyakirin, ku ew bi xwe ne li dije, Kurd bibine xudan dewlet, hema ew ji Kurdan re rê dide nîşan û bal û dîna wan bi ser Türkiye, Îran û Îraqê ve diguhêre, dixwaze ku Kurd, di serî de, li wan welatan axazên xwe yên cudakarî bi cîh bînin, hema di Sûriye de ew li dije…Ta niha hinek kesên bi nav û deng wilo nalên xwe vebirîsandine, hema ji dewletê, an ji deselatdaran, tiştek nehatiye, dibe jî van kesana gotina deselatê bo Kurdan dibêjin.

Tiştê nebaş ku niha têkirin, ewe ku evana û Kurdên ji wan re peyatiyê dikin, bizava xwe dikin, da partiyên kurdî li hev rakin, dij bi hev bi kar bînin…Tirsa min a mezin ewe, ku Kurd bi dav û xefkên wan kevin…Neyar bihêlin û bi kêran zikên hev biçirrînin…

Ev gava Yekîtî wê tevgerê bi giştî bike du par, û para ciwantir wê xortir bibe û bibe kurdistanî...Min di gotara xwe ya dawîn de (bi Erebî: Hembervaniya Sûrî û dayîna nasnameya nîştianî) aniye zimên, ku wê "Caş" ji niha pê ve aşkere bilivin, nema wek berê bi dizî li dij her gaveke ber bi pêş ve dixebitin... Êdî rewşeke nû ya pevçûna siyasî di nav gelê me de li rojayê Kurdistanê dest pêdike.

(*) di helbestên kurdî yên klasîkî de, peyva (axaz) bi kar tê, ne daxwaz (Cankurd)